



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)

wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

**Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî
Xelek 30**

2 - Bingeha yezdanî ya şoreşa Xûramî ya kurdî

Piraniya nivîskarên Misilmanan yên pêşîn *Şoreşa Xûramiyan* wek tevgera asê û şerrûd li dijî *Dewleta Ebbasî* dane xuyakirin û gotine ku alîgirên vê tevgerê gawirên tolaz bûne, rewîşt û nirxên mirovî bi ti awayî li ba wan tinebûne. Bi rêbrê şoreşê *Babek* va rewîştên nizim û kêr zeliqandine. Van nivîskaran ev agahî, bêyî ku jê piştrast bin yan jî lê hûrbûbin, belav dikirin û tenha agahiyên li gor bîr û baweriya *Dewleta Ebbasî* dinivîsandin. Wan ji nezaniya xwe li ser ayîna *Yezdanî*, ya berî *Zerdeştîyê*, destpêdikir û her û her, bi baweriya wan, her ayîneka ji bilî *Îslametiye* ayîneka rêwenda û gawire.

Kok û raha navê Xûramî çi ye?

Di rastiyê da şoreşa *Babek* û alîgirên wî yên *Xûramî*, ne "kêmnirx" bû, wek ku nivîskarên *Misilmanan* gotine. Gava em bi çavekî rexnegir li wan agahiyan temaşê bikin, tê xuyakirin ku ev şoreş şoreşeka kurdî bûye û ramanên wê ji bingehêka bîrewerî niştîmanî hatine wergirtin; armancên wê hem niştîmanî û hem civakî bûne û ji kûraniya dîroka *Ariyanî* hatine. Ji ber wê jî, ramanên wê ji pir kesên Faris û Ermen va jî hatine pejirandin, yên ku li herêmên pêkhatina şoreşê dijiyan, yan jî li derdorên wê diman.



(Keleha Feleka Eflakan li Xûrem-Abad)

Beş û şopên ayîna Yezdanî:

Şopên here navdar yên ku li ser kok û rahên *Yezdaniyê* peydabûne evin:

1- Mezdekî: *Mezdek* (*Mezdûk*) li dor salên 487-ê z. xuyabûye. Peywendiya vî navî bi navê xwedayê *Yezdanî Mezda* ra heye. Tevgera wî wek şoreşeka *Yezdanî* li dijî *Zerdeştîyê* bû (ayîna fermî ya *Dewleta Farisî*) û li dijî çîna arîstokrat û derebeg bû, ya ku piştgiriya desthilata farisî dikir. Hêjayî gotinê ye ku em bêjin *Mezdek* yek ji lawên herêma başûrê çiyayê Zagros bû, ew herêma ku bi piranî Kurdin û li wê herêmê tevgera Xûramî peyda bû. Birêz *Sayks* (1908, rûpel 457) dibêje ku *Mezdek* yek ji oldarên payebilind bû li ba êla *Xoşnav* a Kurd li nawenda Kurdistanê¹.

Hin lêkolîner hene, şopa *Xûramî* wek şaxekî ayînî pêşketî ji *Mezdekiyê* dihejmêrin. Herdu tevger baweriyê bi dijberî û keftelefa *Ahûra-Mezda* (xwedayê ronahiyê) li dijî *Ahûra-Men* (xwedayê şerxwaziyê) tînin. Herdu tevger jî xwedî bernameyeka civakî şoreşgerî ne, dozê ji bo berxwedana li dijî koletî, çewsandin û derebegiyê, ji bo belavkirina zeviyan li ser cotkaran dikin; doza wê yekê dikin ku hemû rûniştivanên welêt sûd û mifayê ji hebûnên gelemperî wergirin, jin ji bin zordariyê bêne rizgarkirin û asta wan bê bilindkirin. Dijminên *Mezdekiyê* ev doza ji bo rizgarkirina jinan ji bin zordariyê, wisa şîrovekirin ku ev yek tê maneya "jin ji bo her kesî azad bin" û bibin milkê seranserê civakê. Lêkolîner *Christensen* gumanê dixê vê mijarê û *Diyakonov* vê şîrovekirinê bi temamî reddike û çewt dibîne².

¹ Huseyn Qasim Al Ezîz, El Babekiye, rûpel 140.

² El-Teberî. Tarîx El-Teberî, 2 / 92. Al Shehristanî, Al Milel wel Nehel, 2 / 52. Ibin Xeldûn, Tarîx Ibin Xeldûn, 2 / 208. Ibin Al Nedim, Al Fihrist, rûpel, 416. Huseyn Qasim Al Ezîz, Al Babekiye, rûpel 146, 147.



(wêneyekî sîmbolîk yê Ahûra-Mezda)

2- Yarsanî: *Yarsanî* şopeka ayînî ye ku bi rahên xwe vedigere ser *Yezdaniyê*. Alîgirên vê ayînê li başûrê Kurdistanê dimînin; li wê herêma ku di navbera Îran û îraqa niha da hatiye beşkirin. Ev kes Kurdin û bi navê *Elî-Îlahî* (yên ku Elî wek Xweda dibînin), yan jî bi navê *Alî-Heq*, *Ehlî-Heq* tên naskirin. Ew bi navê *Kakeyî* jî tên naskirin. Di herêm û erdnîgariya *Yarsaniyê* da Kurdên ku bi zaravayê *Goranî* diaxifin dijîn û Kurdên *Lekî* jî di nav wan da ne.

Baweriyek heye, dibêjin ku navê **Yarsan** ji peyvên "*Yâr -î- sân*" hatiye. Wek tê zanîn, peyva "yar" tê maneya "hezkirê" tiştêkî. Maneya peyva "san" bi temamî nayê zanîn. Hinek şîrovedikin ku ji navê "*San-Sehak*" hatiye. Yanê "*Sultan Sahak*" (*Sultan Îshak*), ew kesayetiya here pîroz di *Yarsaniyê* da. Gelek gengaz û mimkine ku peyva "san" peyveka *Ariyanî* kevin be, bi maneya "roj", ku heya niha jî di zimanê inglîzî da bi awayê "sun"(roj) tê gotin. Yan jî peyva "*Saint*" bi maneya "oldarê pîroz"³.

3- Elewîti: Piraniya Kurdên "*Dimilî*" (Kirmanc, Zaza) li bakurê Kurdistanê û hinek Kurdên Kurmanc jî, ji şopa ayînî ya "*Elewî*" ne, yanê alîgirên Elî ne. Di rastiyê da navê "*Elewî*" awayê bilêvkirina erebî yê ji peyva "*Alavî*" ra ye. Peyva "*Alav*" yan jî "*Alaf*" pêtiya agire. Yanê ew gelê ku agir dipêrêse, yan jî *Zerdeştî*. Alîgirên vê ayînê bi navê "*Qizilbaş*" jî tên naskirin. Yanê ewên ku şaleka sor didin serê xwe. Ji ber ku wan şalên sor didan serê xwe. Li Sûriyayê *Elewî* bi peyva "*Nûseyrî*" tên binavkirin.

Elewî alîgirên "*Nârseh, Nerseh*"-in ku şoreşeka *Xûramî* hên berî *Bebek* pêkanîbûn. Piştî ku ew şoreş têkçû, alîgirên vê ayînê çûn bakurê Kurdistanê ku wê hîngê di bin destê *Emperatoriya Bîzantî* da bû û li derdora herêma Dêrsim a niha bi cih û war bûn⁴.

³ Mihرداد R. Izady: The Kurds , p.145 - 147.

⁴ Mihرداد R. Izady: The Kurds, p. 150 - 151.



(Semaya Kurdên Elewî)

4- Êzîdîtî: Alîgirên ayîna Êzîdîtiyê (*Yezîdî, Yezdanî, Îzadî, Dasnayî*) Kurdên Êzîdî ne. Dijminên vê ayînê ku rastiya wê nizanin, bi mebest wan wek "*Şeytanperest*" binavdikin. Kurdên Êzîdî li gelek herêmên cuda dijîn, bi taybetî li rojava û bakurê Kurdistanê, li Qefqasan û li çiyayê Şengalê û herêma Şêxan yên başûrê Kurdistanê.

Peyva "*Êzdî, Yêzdî*" ji têngîna *Ariyanî* ya kevin "*Yazata*" yan jî "*Yezad*" hatiye ku tê maneya "*Ferişt*". Êzîdî bi xwe "*Melek-Tawûs*" ji ferîştan dihejmêrin; dûrî peyva "*Îblîs / Şeytan*" ku di hersê ayînen "*Cihûyî, Xirîstîyanî û Îslamî*" da tê bikar anîn⁵.

Wek encama gotinê, ayîna niştîmanî kurdî "*Yezdanî*" winda nebû, tevî ewqas zor û setem ji aliyên wan dewletên ku bi navê *Zerdeştî* û *Îslametiye* serdarî kirin. Ev ayîna niştîmanî bi awayên cuda û têvel di *Mezdekî, Yarsanî (Kakeyî), Elewî* û *Êzîdîtiyê* da ma. *Xûramî* jî şopek ji şopên vê ayînê ye. Nîşana hevbeş di navbera van hemû şopan da "roj"e, "tav"e û rengê sore. *Yezdanî* bingeha kûr ya ayînê û felsefî bû ji şoreşa *Xûramîyan* ra bi rêveberiya *Babek*.



(Wêneyekî Melek-Tawûs)

⁵ Mihرداد R. Izady: The Kurds, p. 153 - 154.